

Ev Hejmar

Hejmara yekem a kovara *Devrimci Marksizm* weşana îngilîzî *Revolutionary Marxismê* di dawiya sala 2016'an de hatibû weşandin. Ji Beyrûd û Bakûyê ta Bûenos Aîresê, ji San Petersbûrgê ta Uskupê, ji Mîlanoyê ta Montevîdeoyê li hemû cîhanê belavkarî û firotana wê hat kirin. Dibe ku bi hezaran nefiroto, bes di vê pîvana bisînordar de, peywira xwe bi layikî bi cih anî: Di nav teoriya milîtan Marksistê de tevkariya ji bo enternasyonalîzmê. Encama vê ya xwezayî jî di qadên siyasî û rêxistinî yên li Rojhilata Navîn, Bakurê Efrîkayê, Balkanan û Kafkasyayê, Behraspî û Avrasya û bi giştî yên hemû cîhanê de tevkariya ji bo enternasyonalîzma proleter bû. Bi mebesta vê armancê me gawekî nû avêt û ev sernivîsa ku niha hûn dixwînin, me wergerî hin zimanên din kirin û me di dawiya vê hejmarê de bi cih kir. Bi vî awayî, em ê karibin li hemû cîhanê kesên ku eleqeya wan li ser Marksîzma enternasyonalîst û şoreşger heye û nikarin bi îngilîzî bixwînin cewherê peyama xwe bigihînin wan.

Ev hejmara duyem, yanî *Revolutionary Marxism 2018*, pêşiyê bala xwe dibe ser Rojhilata Navîn, bi du nivîsên pêvek li ser tevgerên paşmayî yên li welatên emperyalîst û rewşa cîhanê, di salvegera sedemîn de, li ser Şoreşa Cotmehê ya ku cejna mezin a gel e, bi dosyeyeke taybet, bi gotareke ku heta Dîwarê Berlînê xera bû welatekî karkeran bû, hilweşîna Bulgaristanê vedikole û bi gotareke din ku di

salvegera 150. de, şahberhema roja îro û siberoja mirovahiyê *Das Kapîtal* digire rojeva xwe ve di heman mebestê de dixwaze xebatên xwe bidomîne.

Hejmara yekem, di nivîsa xwe ya destpêkê de û di gelek gotarên din de, qeyrana aborî a ku bi 2008'an hilweşîna finansalê dest pê kir û deh sal e didome, wek paşxaneyê gelek pêvajoyên ku bi hev re didome girt navendê. Ev pêvajo, di hemû cîhanê de wek faşîzma pêş bilind bû, ya ku hevgeriya wê dike û mînakê balkêş jî bilindbûna DAÎŞ an jî ÎŞÎD ku wek tevgera mezhebî-tekfîrî ya Îslamî derket pêş, şerên herêman wek gefeke şerê cîhanê her çû zêde bû û mirov dikare bilindbûna serhildanên gel jî 2011'an ve wek raperîna (Misir, Tûnûs, Yemen, Bahreyn, Wall Street, Yewnanistan, Îspanya, Turkiye, Brezîlya, Balkan û hwd.) wek di bin awayê parlementeriyê de jî (Podemos, Syrîza, Sanders, Corbyn û ya herî girîng jî li Arjantînê Frente de Izquierda (FIT)) rêz bike.

Ji ber ku hejmara yekem hema piştî hilbijartina Donald Trump ya ji bo welatê herî hêzdar yê emperyalîst yê cîhanê û ji bo mewkîya herî bilind hat hilbijartin derket, ev bûyera tekane di nava nîqaşa di der barê bûyera paşvemayî ya navnetewî wek “populîzm”, “rastgiriya pirole”, “neteweperestî” tê qalkirin xala me ya tevgerê pêk anî. Me Donald Trump wek “faşîstê mayîna aware”, faşîstek ku partiyeke wî ya rûniştî û yekîneyên wî yên paramîlîter tune ye, yanî bi vegotîneke wek pêş-faşîst bi awayekî lez tehlîl kiribû. Di pêvajoya salekê de di encamên bûyerên ku qewimîne de em dibînin ku bê em çî qas mafdar derketine. Peyva “faşîst”, bi taybet piştî bûyerên Charlottesvîlle, çalakiya kesên ku navê nîjadperestên spî û Neonaziyan bêyî ku bikevin fikarê bi kar dianîn, em dibînin ku Trump bi dilekî rehet û bi carekê de erê dike, ji bo ku vî helwesta wî were pênasekirin hat bikaranîn. Îdeologê sereke yê ku navê “*alt-right*” yanî rastgiriya alternatîf li xwe danîne Steve Bannon êdî ne li ser kar e, lê bes hîn jî bi serokê DYA'ê re wekî goşt û neynûk e, wek burokratekî dewletê diçe welatên wekî Çînê û berî ku serokê DYA'ê were bingehe amade dike. Li derveyê sînorên DYA'ê, di plana navnetewî de, “establishment”a lîberal, encamên (bi awayekî xelet) hilbijartinên Ewrûpa, hêza ku wek “populîzm” bi nav dikir neserkefî tespîtkirin bi awayekî lez bû: Li Fransa'yê, nûnera herî zelal a webaya pêş-faşîst Marine Le Pen, di dora duyem a hilbijartinan de ji sê hemwelatîyên fransiyayê dengê yekî wergirt. Li Elmanyayê jî partiya *Alternative für Deutschland*, li gel ku Angela Merkel di polîtîkaya xwe ya koçkirinê de 180 derece vegeriya jî di welatê de bû partiya sêyemîn. Ger ev bin ketibin, ev tevgera navnetewî ku hîn di demeke kin ya berê de bi çavên kesên hişavêtî yên ku li kêlekekê dimînin li wan dihat nêrîn, gelo hîn serketina wan ew ê çawa bûya, mirov merak neke nikare di cihê xwe de bisekine!

Ji aliyê lîberalan di rûyê din yê madalyonê de serketina Emmanuel Macron cih digire. Piştî binketinên yekser yên ku bi Brexit û Trump ve jiyan vê serkeftinê wek paşvegera kûreweriyê şîrove kirin û vê rewşê li gorî dilê xwe şîrove kirin.

Li Fransayê muxalîfên çepgir, ji ber ku bi awayekî kralî û bi KHK'yan (em bi bîr bînin ku ev yek wekî ku ji aliyê estabîlîşmentên lîberal ve dişibînin despotekî ku li Tirkiyeyê jî Erdogan di vê riyê de û hema hema dişibin hev, em vê bi bîr bînin) bi vê atfê navê ku lê kirine kerameta Emmanuelê Yekem piştî ku di raya giştî populeratiya wî hat dîtin serobin bû û her tişt heliya. Ligel radestbûna hin konfederasyonên sendîkayan, serkeftina du grevên ku di deh rojan de pêk hatin (12 û 21 Îlon), wekî ku me di hejmara xwe ya yekem de jî destnîşan kiribû "bihara fransiyân" a ku me ji bo tevgera "sosyalîst" ya li hember Zagona Kar ya hikumeta François Hollande derketibû ew ê berdewam bike. Wekî ku me di hejmara xwe ya yekem de jî binê wê xêz kiribû, Fransa li Ewrûpayê hîn jî dibe welatê di rola mifteyê de. Riya Macron ya kûreyî û neo-lîberal li hember Trump û Le Penan nikare bibe derman. Encax têkoşîna yekbûyî û serxwebûna çîna karkeran dikare bilindbûna vê melanetê vegeirîne. Asoya cîhanê hîn bi Modiyân, Duterteyan Putinan, Erdoganan, Aliyevan, Orbanan û Trumpan ve tije ye.

Piştî ku me di hejmara xwe ya yekem de binê gefa şerê cîhanê xêz kiribû vir ve, dibêtiya şerekî li hemû rûyê cîhanê bi awayekî aşkere li holê ye. Ji bo kêliyekî em çîleyên bi dawî nabin ên ku li Suriyeyê, Irakê, Yemenê, Libyayê tên jiyîn û dîsa şerê ku ji kûrahî ve li Ukraynayê dişewite em deynin aliyekî jî, Asya bi cure pevçûnên di navbera herêma jeo-strajîk a emperyalîzmê û Çînê de tijî ye. Mînaka vê ya herî girîng helbet di navbera DYA û Koreya Bakur de pêş dikeve ku ev polîtîka bilindkirina gefa rageşiyiyê û ev yek piştî ji 70 sal berê ji Hiroşîma û Nagazakî cara yekem e. Trump, bi mehdê xwe yê em pê dizanin ê pêş-faşîst, gefên ku ew ê li Koreya Bakur "bi milyonan kesan bikuje" û hemû welat bi erdê re bike yek avêt. Tam li dijî tabloyên ku "civaka navnetewî" (bi navê din emperyalîzm) û çapemeniya kapîtalîst bi daneyên çêkirî xêz kirine, amadekariyên nukleer yên Koreya Bakur, li hember DYA'ya ku dixwaze li Pasîfikê serweriya xwe ya leşkerî ava bike, li hember 80 hezar leşkerên DYA yên li Japonya û Koreya Bakur û bi giştî li hember gefa ku şerê li Asyayê xwe di asoyê de nîşan dide bergiryeke parastinê ye. Dewleteke karkeran a ku wek burokratîk dejenere bûye gava ku bi emperyalîzmê re rûhev were, heta di karîkatura ku dewleta karkeran xwe spartîye "yek xanedana sosyalîzmê" de jî, divê Marksîstên Şoreşger li pişt dewleta karkeran cih bigire.

Di xaleke nêzîktirî welatê me de, li herêma me Rojhilata Navîn û Afrîkaya Bakur, pêla paşverû ya ku Trump nûneriya wê dike rêzîkirina hêzan guhert. Trump li Washîngtonê di serdana Bonapartê Misirê el-Sîsî de piştgiriyeke mezin dayê û piştî vê jî bi şatafateke mezin çû serdana Erebestana Suudî. Kêliya herî pespaye ya serdanê, gava ku figuran di plana dawî de nobetê digirtin sêyîneyên qeşmer yên ku ji Trump, Kral Selman û Serokkomarê Misirê pêk dihat kureyeke erdê ya dibiriqe bi destê xwe miz didan pêk hat. Tunebûna du aktorên vê kêliyê watedar dikir. Ji aliyekî ve, Îsraîla Siyonîst, aqilmendê vê tifaka nû ye ku bi çavan nedihat dîtin bû.

Hat dîtin ku beralîbûna siyasî ya Trump a li hember Îranê û wek alîgiriya Îsraîl, hemû nakokî û têkilheviya di polîtîkayên ji bo herêmê dikarî derbas bike. Trump, ligel hewldanên vekirî yê ji bo nêzikî Putîn bibe û dîsa ligel tifaka ku hema hema ne mimkun e xera bibe ya Rûsyaya Putîn û Îran, wekî ku di axaftina wî ya dawî ya di NY'ê de kirî hat dîtin bi mebesta Îranê îzole bike û serî li vî welatî bitewîne ji bo ku tifaqêqê di navbera hêzên paşverû yê Rojhilata Navîn de ava bike di nava hewldaneke mezin de ye. Heman cihê wê hatiye, divê em vê jî diyar bikin ku sedema ku dixwazin Hamas serî li ber Misir û Îsraîlê bitewîne jî ev e. Kesê ku tunebûna wî balê dikşîne jî, sedemeke nakokiya polîtîkaya Trump ya Rohilata Navîn û Efrîkaya Bakur Erdogan bû. Hinceta fermî, serdana Trump, bi kongreya partiya Erdogan a ku piştî referandûma 16'ê Nîsanê hevsarê partiya xwe ji nû ve bixe destê xwe pêk dihat li hev rast hatin. Lê bes di demeke kurt de derket holê ku sedema rastî cuda bû.

Suudiyan, ji bo ku Trump pêşwazî bikin çî ereb çî jî ne ereb gazî gelek welatan kir, bi vî awayî dixwestin hêza mezhebî ya Sunnî mezin bikin û derxin pêş, lê ev yek kurt demî çêbû. Hema piştî pîrozbahiyên yekîtiya ku bi helwesta generalê serketî kirin qeyrana Qetarê teqîya û navbera kampa serokatiya Suudî û kampa Rabîayê vekir. Ji bo ku gotina me were famkirin li honaka vê bûyerê binirên. 2013: Derbeya Bonapartî ya Sîsî, bi piştgiriya Erebbîstana Suudî li Misirê hikumeta Birayên Misli-man (Îhvan) û Mûrsî hildiweşînin û bi awayekî xwînsarî bi sedan alîgirên Îhvanê li Kahîre li meydana Rabîya-tul Adeviyye qetil dike. Bi vî awayî, ji ber ku Erdogan hemû stratejiya xwe bi Îhvanê re bi tifaka gelek welatan re (Tûnûs, Sûriye, Fas, Fîlîstîn yanî Hamas, Misir) li ser serokatiya cîhana Sunnî ava kiribû di navbera Erebbîstana Suudî û Tirkiyeyê de qetandinekê ava dike. 2015: Erdogan ligel xêza xwe ya vekirî ya Rabîayî, piştî mirina kralê berê yê Erebbîstana Suudî bi kralê nû Selman re têkilî datîne, di ser de jî di dawîya 2015'an de beşdarî Tifaka Îslamî ya li Hember Terorê dibe ku ev tifaq bi pêşengiya suudiyan pêş dikeve û 34 welatên sunnî tîne gel hev û bi Suudî û Qatarê re (li van her du welatan baldar bin!) di Sibata 2016'an de li Sûriyeyê ji ketina şerekî vedigere. Tîrmeh 2016: Kampa Suudî, Erdogan li hember hewldana derbeyê ji qedera xwe re terk dîkin. 2017: Di nav 13 şertên ku koalisyona li hember Qatarê ku pêşengtiya wê Erebbîstana Suudî dike ji bo li hev kirinê pêşkêş kirin de kişandina leşkerên tirk yê ji Qatarê jî cih digire. Ev daxwaz ji aliyê Tirkiyeya ku bi stratejiya xwe ya Rabîayî sadîk dimîne û alîgiriya Qatarê dike ve tê redkirin. Piştî hewldana derbeyê ya 15 Tîrmehê, Tirkiye ji bo ku di qada navnetewî û siyaseta hundirîn de tehdeyên ku ji aliyê DYA û YE'yê werin hevsenga wê çêbike berê xwe da kampa Rûsya û Îranê.

Ev hemû nîşan didin ku, hêzên mezhebî yê Sunnî yê li Rojhilata Navîn û Efrîkaya Bakur li hember kampa Şîî ya ku pêşengtiya wê Îran dike koalisyoneke qewî û yekgirtî ava nekiriye. Lê bes ev yek, nayê wê wateyê ku gefa şerê mezhebî ya ku ew ê li hemû rûyê Rojhilata Navîn belav bibe di rabirduyê de maye. Wateya

vê ev ev, kampa Sunnî wekî ku demekê dixuya ne yekgirtî ye, qada manewrayê ya Îranê heye û bi hindikayî be jî dikare hin welatên ku di kampa Sunnî ya paşverû de cih digirin bêalî bikin. Gef hîn jî berdeyam dike û gengaz e ku bi polîtîkayên Îsraîl û Trump ve ew ê emrê wê dirêj bibe, bi şerên bêdawî yê wekaletan yê ku li Sûriye, Irak û Yemenê tên meşandin tê dîtin. Tenê bloka serbixwe û yekgirtî ya çîna karkeran û hêzên sosyalîst yê li Rojhilata Navîn û Efrîkaya Bakur bi hêzên dişibin hev yê li Balkan û Behraspî ya Bakur re tifaqê bikin, dikarin li hember gefên ku ew ê bibe sedema qetilkirina civakan û windabûna qetilkirina çanda gelan yê şerê mezhebî yê Sunnî û Şîî bibin asteng. Wekî ku di encamnameya 4. Konferansa Ewrûpa-Behraspî (26-28 Gulan 2017) ku li Atînayê pêk hat de -Ev encamname di vê hejmarê xwe de em jî cih didinê- hatiye gotin: “Qetlîam encax dikare bi saya eniyêke fireh a hêzên anti-empyeralîst, anti-Siyonîst yê ku li welatên xwe bi hêzên paşverû re di têkoşînê de ne dikare were astengkirin. Tenê Federasyoneke Sosyalîst ya di pîveka Rojhilata Navîn û Efrîkaya Bakur dikare dawî li pirsgirêkên herêmê bîne.”

Li vê gerînekê, serokê Kurdîstana Irakê Mesût Barzanî referandûma serxwebûnê ya ku ji bo werin ser dikê gazî şeytanên sedsalî yê hêzên herêmê û manewrayên empyeralîzmê dike zêde kir. Marksîstên Şoreşger alîgirê mafê tayîna qedera xwe ya kurdan e. Mesele ew e ku referandum ne ji bo mafê xwe yê tayîna qedera xwe ye, Barzanî ji bo xwe û ji bo cuzdanê alîgirên xwe yê rantxurên petrolê dagire hatiye kirin. Barzanî li hember azadiya kurdên li parçeyên din (Tirkiye, Îran, Sûriye) şer kiriye û wisa nişan dide ku di siberojê de jî di neyta şerkerinê de ye. Yanî serkeftina referandûmê, li gel ku ew ê li Rojhilata Navîn ji empyeralîzmê re eniyêke nû veke, bi awayekî îronîk, ew ê were wateya binketina doza rizgariya netewî ya Kurdistanê. Marksîstên Şoreşger bê dudilî li hember mudaheleyeke leşkerî ya hêzên herêmê ji bo Kurdîstana Irakê ye, lê bes li hember Barzanî û li gel rizgariya hemû gelê kurd disekine.

Dosyeya me ya yekem, him li maweya kin him jî li maweya dirêj dinêre, bi aliyên cuda yê têkoşîna li herêma Rojhilata Navîn û Efrîkaya Bakur ve eleqedar dibe. Gotara yekem a vê dosyeyê şerê hundirîn yê Sûriyeyê û bandora navnetewî ya vî şerî paye bi paye vedikole. Gotara Levent Dolek ya sernavê “Li Sûriyeyê şerê hundirîn: Merhele, ders û siberoja şerê hundirîn yê Sûriyeyê”, bi teşhîsa ji ber ku serhildana gel ya li hember dîktatoriya Esad dest pê kiribû nekarî çerçoveyeke siyasî ya proleter bigire, di demeke kurt de ji manîpulyasyonên empyeralîzm û dewletên paşverû yê herêmê re vekirî ma, dest pê dike. Empyeralîzm, Sîyonîzm, û (wek Erebiştana Suudî, Qatar, Turkiye û Îran) hêzên herêmê bi mudaxeleyan serhildana gel vedigerîne şerê mezheb-olî yê di navbera Sunnî û yê din de (Elewî, Durzî, Xiristiyan û hwd.) Di vê gotarê de, di şerê hundirîn de analîza berfireh ya faalîyetên leşkerî yê hemû aktorên girîng (DYA, Rûsya, DAŞ, OSO û hwd.) tê kirin. Be-

şeke gotarê jî ji pêşketinên li Kurdistana Sûriyeyê re hatiye veqetandin. Dolek tîne ziman ku bingeheke hêzdar û pêşketî ya tevgera kurd li Rojava heye, bes hevkarîya leşkerî ya ku bi DYA'yê re dikin him xelet û him jî xetere dibîne. Em wisa difikirin ku ew ê gotara Dolek, di salên pêş de jî li ser şerê hundirîn yên Sûriyeyê çavkaniyeke biqîmet be.

Gotara Kûtlû Dane ya bi navê “Dagirkeriya Sîyonîst û Deklarasyona Balfoûr”, perdeya paş ya mêtîngerkirina Fîlîstînê bi awayekî berfireh lêkolîn dike. Dane, ji pozîsyona guhertî ya hemû aktorên ku rol lîstine (tevî emperyalîzmên Brîtanya û Fransa û Dewleta Osmanî) ronahiyekê pê dixe (ên ku ji bo avakirina dewleta Îsraîl çeka vekirî dane) û girêdana dîrokî ya Deklarasyona Balfoûr ya sala 1917'an radixîne ber çavan.. Gotara Dane, nîşan dide ku di sala 1948'an de avakirina Îsraîlê him emperyalîzma DYA'ê û him jî (di wê demê de polîtîkaya bi “emperyalîzmê re di nav aşitiyê de bijî” dimeşand) Yekîtiya Sovyetan piştgirî daye. Binê wê xêz dike ku di fîlatê de hemû hêzên paşverû yên li herêmê jî piştgiriya Îsraîlê kiriye. Wekî ku Dane destnîşan kiriye, li Tirkîyê hikumeta heyî AKP (Bi Îsraîlê re di gelek qadan de hevkarîyê kiriye û hîn jî dike û doza Fîlîstînê tu carî jidil nepejirandîye) jî piştgiriya Îsraîlê dike.

Sûngûr Savran, ji destpêka sedsala bîstemîn heta roja me şoreşên Rojhilata Navîn lêkolîn dike û ji van encamên giştî derdixîne. Li gorî Savran, Rojhilata Navîn di sedsala bîstemîn de gelek şoreş hatine jiyîn û şoreşên yekemîn yên sedsala bîst û yekemîn jî li vê herêmê hatin jiyîn (Misir û Tûnûs). Gotar, destnîşan dike ku di sedsala bîstemîn de li Rojhilata Navîn çar pêl şoreş hatine jiyîn û di sala 2011'an de şoreşên ereban jî wek pêla pêncemîn tê nirxandin. Wekî ku Savran jî destnîşan dike, piraniya pêlên şoreşî, xeletîya bawerîya ku bi awayekî hêsan û oryantalist ya ku “Civakên misliman, ji ber bawerîya Îslamê îteatkar in û ji ber vê jî şoreşê nakin” derdixîne holê. Ev yek, di heman demê de ji bo teza Marksîzmê ya ku dîrok ne bi awayê peresanê bi hingavtinên şoreşî pêş diçe delîleke hêzdar pêşkêş dike. Herî dawî, gotara Savran, nîşan dike ku dîroka Rojhilata Navîn di xalên şoreşî de hatiye diyarkirin, îddîaya ku reformîst (dibêjin şoreş dibêtiyeke dûr e û divê siyaseta çepgir guhertinên biçûk bike hedef) dibêjin “rasteqîn” e bêbingehbûn û lawazbûna wê teşhîr dike. Di eslê xwe de, ger şoreş nebin (biçûk an jî mezin) ne gengaz e ku hedef bi dest bikevin. Bi vegotîneke din, dîrok nîşan dike ku şoreş ji reformê bêhtir armanceke “rasteqîn” e.

Dosyeya pêvek, meylên paşverû yên aliyên din yên cîhanê û bersivên ku divê ji wan re were dayîn hildigire dest. Di gotara xwe ya bi navê “Azîneyên famkiriya ‘Hemdem’ê: Nîqaşek li ser populîzm û faşîzmê” Cenk Saraçoğlu, diyar dike ku ji bo van tevgerên paşverû werin famkirin têgeha faşîzm ji têgeha (di çepgiriya navnetewî de têgeheke gelek populer e) “rastgiriya populîst” bêhtir guncantir û bikarînantir e. Saraçoğlu, wek taybetîya ji hev veqetîne ya di heyna navbera her

du şerên cîhanê ya tevgerên faşîst û rejîman “hilweşîneriya şoreşî- hember” û “ne hemdemî”yê diyar dike û tevgerên paşverû yên roja me bi bikaranîna van têgehan birawird dike. Saraçoğlu, diyar dike ku tevgerên paşverû yên wek Macaristan û Tirkiye ku hinekî li derdorê cih digirin, li gorî welatên rojavayî yên pêşketî bêhtir dişibin faşîzma klasîk.

Nêzîkatîyeke hinekî cuda ya ji bo rewşa Ewrûpa û cîhanê, di dawîya Gulana 2017’an, ji 18 welatan milîtan û rewşenbîr bi taybet di çarçoveya Ewrûpa û Rojhilata Navîn-Efrîkaya Bakur, ji bo ku riya were şopandin nîqaş bike çalakiya navnetewî ya ku beşdar bibin, di Encamnameya Konferansa Ewrûpa-Behraspî ya 4. de hatiye pêşkêşkirin.

Îsal sedemîn salvegera Şoreşa Cotmeha 1917’an e. Ev bûyera ku azîne vedike, tenê ne ji bo gelên Rûsyaya Çarî, ji bo hemû mirovatîyê û bi taybet jî ji bo hemû karker, kedkar û bindestên cîhanê asoyên nû vekirin. Em vê bûyera cîhanî-dîrokî pîroz dikin û azîneyên wê yên cuda bi çar gotaran digirin dest.

Bi gotara xwe “Cotmeh 1917: Bûyereke di asta cîhanî de” Savas Mîhaîl, bi gotara feylozofê fransî Alaîn Badîou ku piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetan demeke kurt nivîsandibû di nava diyalogê de têkilî û cudahiyên di navbera 1917 û 1991’ê de nîqaş dike. Savas Mîhaîl tîne bîra me ku 1917 bûyereke di asta cîhanê de ye û ji aliyê her kesî ve wek destpêka şoreşa cîhanê ya sosyalîst tê dîtin. Şoreşa civakî ji Rûsyayê ber bi Ewrûpaya Rojhilat û Navîn ve belav bû û bandora wê ji Ewrûpa dirêjî Asyayê û DYA’yê bû. Wekî ku Keynes jî wê demê hay ji vê heye, Bolşevîzm û Şoreşa Cotmehê ji bo pergala kapîtalîst a kureyî gefeke rasteqîn pêk dianî. Di vê babetê de, Şoreşa Cotmehê teqez interfereke ku hîn dema wê nehatî û qewimîye nîn bû. Tam li dijî vê, “bûyer”eke ku di giringiya cîhanî-dîrokî ku ji bo mirovahiyê serdemeke nû daye destpêkirin. Li dijî vê, 1991, wek bûyereke ku ne “bûyer” e hatiye kirin: Ji bo mirovahiyê serdemeke nû nedaye destpêkirin. Savas Mîhaîl, dibêje hîn dewra ku Şoreşa Cotmehê vekirîye nehatiye girtin û gotara xwe bi dawî dike. Em hîn jî di serdema Cotmehê de dijîn û di sedsala nû de divê em şoreşê domdar bikin.

Gotara Ozgur Ozturk ya bi navê “Di sedsala 21. de planlamaya sosyalîst”, potansiyela sosyalîzmê, bi referansa derfetên roja me nîqaş dike. Ozturk, ji niha de, hewl dide ku pêşnumayeke pergala plankirina aboriyê ya ku piştî şoreşê di nava çend salan de dikare were avakirin derbixîne. Li gorî Ozturk, di sedsala 21. de, dikare planlamayeke ji sedsala borî di bingeha xwe de cuda bêhtir bi bandor were avakirin. Gotar, destnîşan dide ku yek ji pîrsgirêkên herî sereke yên avakirina sosyalîzma sedsala 20. nekariye pêşiya ku pere bibe wek sermayeyê bigire. Bes (wekî ku em di “Rexneya Bernameya Gothayê” ya Marks de dibînin) pergaleke “dayîne” û planeke ku li ser ked-demê were avakirin ew ê têkiliyên pereyî û bi vê yekê ve girêdayî gefa ku sermaye derxîne holê bi sînor bike. Jê zêdetir, pergaleke wisa ew ê pîrsgirêka hesabkirinê jî bi awayekî hêsan çareser bike. Ozturk di heman demê de têkiliyên

enduristiyê yê nû ku dibêtiya wan heye jî nîqaş dike û derdixîne pêş ku di şertên roja me de, rejîmeke sosyalîst bi awayekî rasteqînî dikare îstihdama tam, otomasyona tam, sifir qezayên kar û bi awayekî payeyî kurtkirina saetên kar wek hedef bigire pêşiya xwe. Ozturk, diyar dike ku ev di bin banê têkiliyên kapîtalîst de tu demê bi temamî ew ê rasteqîniyê pêk neyên.

Armagan Tûlûnay, aliyekî din ê Şoreşa Cotmehê digire dest ku ev yek ji aliyê hin derdorên ve bi awayekî kêmtir hilgirtiye dest. Ji 1980'ê vir ve di nava çepgirên de piştî ku vegereke antî-Lenînîst û heta antî-Marksîst dest pê kiriye, di meseleya rizgariya jinan de girîngiya Marksîzm wek ramanê yekgirtî û bername, komunîzm jî wek lêgerîneke civakî ya cuda her diçe tê redkirin. Derman di siyaseta nasnameyê de bû. Tevgera komunîst hay ji bindestiya jinê tune bû û ji bo rizgariya jinan tiştekî ku pêşniyaz bike tune bû. Tûlûnay, polîtîkayên ku Bolşevîkan piştî şoreşê xistine meriyetê lêkolîn kiriye, Bolşevîzma di pêşengtiya Lenîn û Trotskîyê de bernameyê begiriyê ya ku di welatê herî pêşketî yê kapîtalîst de jî nikare were xeyalkirin xistine meriyetê, di navbera zayendan de ne tenê formel xwestine wekhevîyê rasteqîn ava bikin. Wisa dixuyê ku ji bo bindestiya jinan, qandî ku bi “establishment”a lîberal a ku herikînen roja me yê antî-Marksîst û post-modernîst heyranê wê ne neyê muqayesekirin hestiyar e, qandî jî nîqaşê re ne vekirî be nîşanê me dide. Wekî ku Tûlûnay di gotara xwe de destnîşan dike, burokrasiya ku îktîdara siyasî rapêçandiye ji holê rakirina wan ya van meriyetan nikare wek delîla ku komunîzm ji bo bindestiya jinê nehestiyar tevgeriyaye nîşan bide. Axir di dawiyê de, burokrasiya dev ji komunîzmê berda, ji ber vê jî tu faalîyetên burokrasiyê nikare komunîzmê di bin tawanbariyekê de bihêle.

Gotara me ya bi babeta Şoreşa Cotmehê, li ser qadeke ku Marksîzma Rojava her gavê paşguh kiriye xwar dibe. Demêke dirêj, îktîdara proleterya cara ewil ji aliyê rûsan ve, yanî bi dibêtiyêke mezin ji aliyê neteweyên Ewrûpaya mezin yê herî paşmayî ve ketiye meriyetê, her gavê tê gotin. Lê bes şîrovekerên ku bi berçavka Rojava dinêrin, her gavê ji bîr kirin ku Şoreşa Cotmehê, ji vê wêdetir şoreşa gelên musulman e. Bi beralîkirina Lenîn ve Yekîtiya Sovyetan a ku di 31 Berfanbar 1922'an hat avakirin beşeke wê ya girîng ji gelên musulman û turk yê ku li sînorên rojhilatê Rûsyaya Navîn (Tatar, Başkir, Kalmuk, Daxistan, Çeçen û hwd.), Transkafkasya (Azerî, Abhaza û hwd.) û Asyaya Navîn (Kazakîstana îroyîn, Turkmenîstan, Ozbekîstan, Kırğızîstan û Tacikîstan û hwd.) cih digirin pêk dihatin. Sûngûr Savran, di vê gotara orjînal ya ku girtiye pênûsê de, bi awayekî cewherî behsa piştî serkeftina şoreşa komunîzm/Bolşevîzmê bê çawa dilê gelê musulman kifş kiriye û çawa gel û erdên gelê musulmanên komunîst bi dest xistiye vedibêje. Wek bûyera Şovenîzma Mezin a Rûsyaya ku di serdema Stalîn de bilind bû tê binavkirin çawa jiyana gelên musulman bandor kiriye ev yek jî dikare bibe mijara xebateke din.

Nivîseke ku bi awayekî fetlokî bi gotarên ku di der barê Şoreşa Cotmehê de

hatine nivîsandin girêdayî ye, li xerabûna avakirina sosyalîst ya sedsala 20. ji aliyê Bulgaristanê ve dinêre. Gotara Danîela Penkova ya bi navê “Di Kemîna Neoliberalîzmê de Bulgaristan”, pêvajoya restorasyona kapîtalîst ya piştî 1989’an ya li welat lêkolîn dike. Nivîskar, destnîşan dike ku saziyên sermayeya navnetewî, bi taybet ÎMF û Benkaya Cîhanê, ji Bulgaristanê re, reçeteyeke ku ji bo Welatên Sêyemîn yên Cîhanê derxistine tê spartin. Bulgaristan bi 1989’an ve welatekî senayiya wê pêşketî û standerdeke berbiçav ya jiyanê hebû, piştî 1989’an reçeteyên noe-lîberal (taybetîkirin û bêregezkirin) gelê Bulgaristanê feqîr kir. Gotar, destnîşan dike ku her çî qas Bulgaristan li ser kaxezê mezin dibe were dîtin jî nikare pêdiviyên jirêzê yên gelê xwe jî bi cih bîne. Penkova, di dawîya nivîsa xwe de dibêje; ji bo ku Bulgaristan karibe bigihêje senayiyeke rêk û pêk û civakeke girseyî, divê dev ji polîtîkayên neo-lîberal berde û ev yek pêwistiyeke mezin e.

Ev sal ne tenê sedemîn salvegera Şoreşa Cotmehê ye, di heman demê de salvera sed û pênciyemîn çapkirina cilda yekem ya *Kapîtalê* ye. Ji ber vê sedemê jî me di gotara xwe ya dawî de cih da rêbaz, naverok û giringiya vê şahberhema ramana mirovahiyê ye ku senteza şoreş û zanyariya civakî ye.

Kapîtal, di dahûrana dawî de, şewaza hilberînê ya kapîtalîst derfetên ku mirovahiyê ragirîne siberojeke baştir bi awayekî payeyî bi dawî bûye, ji bo ku enerjîya hemû karkerên cîhanê ji bo mebestên pêşketî derxîne holê di der barê hilweşîna vê azîneya hilberînê de ye. Gava ku em li qeyrana aborî ya navnetewî ya kûr, li gefa şerê cîhanê yê nukleer ku li ser serê me radiheje û li tekane çavkaniya ji nû ve hilberînê ya mirov û jîndarên ku li ser rûyê erdê dijîn tunekirina xwezayê binêrin bi awayekî vekirî em dibînin ku em gihîştine vê merheleya dîrokî. Parastina mirovahiyê û heta bi giştî parastina jiyanê, bi mulkiyeta kolektîf ya navgînên hilberînê û bi hatîna şewaza nû ya hilberîneke ku li ser planlameya navendî û demokratîk hatibe avakirin û bi pevgîna biratiyê ya hemû netewên cîhanê ve girêdayî ye. Bi kurtî, ya ku hewcedarî pê heye sosyalîzmeke enternasyolîst e. Ev jî encax dikare bi hêzên proleterayê, bi têkoşîna çînî ya şoreşgerî ve bikeve meriyetê. Hewcedarî bi partiyên şoreşger û Enternasyoneleke şoreşgerî heye. Marksîzma Şoreşgerî ev e û kovara me jî ji ber vê sedemê vî navî bi şanazî pejirandiye.

Translated by: Mehmet Çakmak